

LET'S DO THIS – Kurdish Kurmanji

Vaksîna COVID-19 ji bo zaroyên (5-11 salî)

DEMÊ ÇÊBIKE

Çima divê zaroyên 5 - 11 salî li dijî COVID-19 werin vaksînkirin?

COVID-19 vîroseke ku dikare bibe sedema nexweşiyên giran û mirinê, û herweha pirsgirêkên tenduristiyê yê demdirêj. Ew dikare bi hêsanî di navbera kesan de belav bibe û hin çaran nîşanên kêma hene yan jî nînin, ev yeka zehmet dike ku hûn zanibin ka we vîros berî hûn bidin kesên din heye yan nîna.

Her çend e ku enfeksiyona COVID-19 di zaroyan de bi gelemperî ji mezinan siviktir e jî, sedemên bihêz hene ku piştgirî bide vaksînlêdana zaroyan:

- Vaksînlêdan alîkariyê dide pergala parastinê. Bi vaksînlêdana zaroyên xwe, ji bo parastina wan ji nexweşiyên giran yê ji COVID-19 û bandorên demdirêj yê gengaz bibin alîkar.
- Vaksînlêdan di heman demê de alîkariya parastina heval, malbat û civakê dike, tevî kesên lawaz yê ji her temenî, bi alîkariya kêmkirina veguheztinê.
- Vaksînlêdan dibe alîkar ku zarok di xwendegehê de bimînin û beşdarî çalakiyên civakî bibin ku ji bo fêrbûnê û pêşkeftina wan girîng e.

Bi mîlyonan zarok li çaraliyê cîhanê li dijî COVID-19 bi ewlehî hatine vaksînkirin. Delfîl nîşan didin ku vaksînlêdan di zaroyan de li hember nexweşiya giran ya ji COVID-19 parastinek e hêja pêşkêş dike û dibe alîkar ku malbata we ewle û baş bimîne.

Ma zarok wek mezinan heman vaksîn û dozê werdigirin?

Na. Vaksîna pejirandî ji bo zarokên 5 - 11 salî vaksînlêdana taybetî ya Pfizer (Comirnaty) ya zarokan e, bi du dozan 8 heftan ji hev cuda tê dayîn.

Vaksîna Pfizer ji bo zarokên 5-11 salî dora sêyeka dozê ye ku ji kesên 12 salî û mezintir re tê dayîn. Di vê koma temenî de dozê piçûktir tê bikar anîn ji ber ku ew dikare di zarokan de heman asta parastinê ya bilind bi dest xîne wekî doza ku ji kesên 12 salî û mezintir re tê dayîn.

Ma bandorên alî ji bo zarokan wekî yê ku di mezinan de têne dîtin?

Erê. Piştî wergirtina vaksînlêdana COVID-19, zarok dikarin mîna mezinan heman bandorên alîgir yê hevpar hebin.

Bandorên alîgir bi gelemperî sivik in û piştî rojekê yan du rojan diçin û dibe ku ev in:

- Serêş
- Ta û serma
- Westabûn/westayî
- Êşa masûlkan û êşa mil li cihê vaksînlêdanê

Bandorên alîgir yê piçûk normal in û destnîşan dikin ku pergala berevaniyê bersivê dide vaksînê. Bandorên alîgir yê ciddî yê ji vaksînan pir kêma in, digel ku metirsiya heman bandorên alî ji girtina COVID-19 bixwe pir zêde ye. Ger bandorên alî berdewam bikin yan hûn bi xemin, bi doktorê xwe re bipeyivin.

Gelo rîska bandoreke ciddî tê wê wateyê ku divê ez vaksînê li zarokê xwe nexim?

Na. Hemî vaksînên COVID-19 yên li Australya tên bikar anîn xwedan profilên ewlehiyê yên baş in û berî werin pejirandin bi tundî hatine ceribandin û nirxandin ji aliyê Rêveberiya Kelûpelên Terapûtîk (TGA) û Koma Şewirmendiya Teknîkî ya Australya li ser Vaksînlêdanê (ATAGI).

Zêdetirî 5 mîlyon zarokên li Dewletên Yekbûyî yên Amerîka û bi mîlyonan zêdetir li seranserê cîhanê zarokên di navbera 5-11 salî heya roja îro bi ewlehî vaksîna COVID-19 wergirtine.

Ma dê vaksînlêdana COVID-19 bandorê li mezinbûn, pêşkeftin, yan jî berhemdariya pêşerojê ya zarokê min bike?

Na. Tu delîl nînin ku vaksîna COVID-19 bandorê li mezinbûn û pêşkeftina zarokê bike.

Bandorên demdirêj ên ji COVID-19 dikarin bandorên mayînde li ser ten-duristî û bextewariyê bikin. Rîska tevlihevbûnên girtina vîrosê ji ban-dorên alî yên sivik yên vaksînlêdanê zêdetir e.

Ger zarokê min berê COVID-19 girtibe ma pêwîste were vaksînkirin?

Erê. Zarokên ku bi COVID-19 ketibin, dema ku ji nexweşiyê xelas dibin divê vaksînê werbigirin da li dijî enfeksiyonê werin parastin.

Ma zarokê min bêyî razîbûna min dikare were vaksînkirin?

Na. Zarokên 5 -11 salî ji dêûbav yan weliyê qanûnî hewce dike ku razîbûna xwe bidin da vaksîna COVID-19 wer-bigirin.

Razîbûn di dema danîna demê de, û dîsa di dema hevdîtîna de pêwîst e. Ger dêûbav yan welî nikaribin bi zarok re beşdar bibin, ew dikarin mezinekî din li şûna xwe bişînin dema ku di pêvajoya dem danîna razîbûna serhêl temam dînin.

Hûrguliyên mezinên pêşniyarkirî yên namzed divê di dema dem danîna de bêne peyda kirin da ku nasnameya wan û destûra dayîna razîbûna bi wekîl di roja hevdîtîna de were verast kirin.

Ji bo bêtir agadarî li ser razîbûnê, biçin: [Vaccination consent FAQs for parents and guardians \(Pirs û bersivên erêkirina vaksînlêdanê ji bo dêûbav û welî\)](#).

Ma vaksînlêdana COVID-19 ji bo zarokan mecbûr e (tevî xwendegeh û werzîşê hwd)?

Na. vaksînlêdana li dijî COVID-19 ne mecbûr e, lê ew bi tundî tê teşwîq kirin.

Hewce nake zarok vaksîna COVID-19 hebin da ku beşdare çalakiyên werzîşê yên xwendegehê yan civakê bibin.

Ma zarokê min dikare vaksîna bûster werbigire?

Na. Kursê vaksînlêdanê ya destpêkê, di mirovên ciwan de bersiveke xurt ya parastinê çêdike.

ATAGI dê bifikire ka di pêşerojê de ji bo vê koma temenî dozeke bûster hewce ye.

Ma dê zarok li xwendegehê li dijî COVID-19 werin vaksîn kirin?

Na. Ji bo vaksînlêdana COVID-19 ya zarokê xwe bi doktorê xwe, dermanxaneyê herêmî, Xizmeta Tenduristiya Kontrolkirî ya Civaka Aborjînî yan klînîkeke vaksînlêdanê ya Tenduristiya NSW demekê çêbikin.

Ez çawa demê wergirim?

Dêûbav tene teşwîq kirin ku di zûtirîn dem de ji bo zarokê xwe hevdîtina vaksînlêdanê çêbikin.

Hevdîtîna niha bi serhêl çêbikin - www.nsw.gov.au/covid-19/vaccination/get-vaccinated

Ji bo hevdîtîna telefon bike: Xeta alîkariyê: 1800 57 11 55 / Xizmeta Wergerandinê (TIS): 131 450.